



# Rojnameya ENKS

**Weşanên Siyasî - Hunerî - Çandî û Civakî**

---

**Sernûser . Yisra Zibêr**

**Bo têtilyê bi me re, li ser emailê  
[rojname.enks@gmail.com](mailto:rojname.enks@gmail.com)**

Gelê kurd û hemî welatparêz li hêviya yekrêziya mala kurdin li Rojavayê Kurdistanê ku Karibin xaka xwe bi parêzin û mafên xwe misoger bikin di nav gur û çeqelan de ku hawîrdora wan kom dibin.

**ENKS**



Dîrok: / 1 / 1 / 2018

Hejmara 0



... Taybetmendiya kurdên sûryê ...

Ebdelah Gedo



Berî şêst salî partiya kurdî yekemîn li sûryê duruşma (simbola) rizgarkirin û yekîtiya her çar parçeyên kurdistanê hilda bû, belê piştî ezmûna çend salan, konevanên (siyasiyên) kurd, ji şarezayên ewê partiyê, duruşma partiyê guhertin, bo : dabînkirina mafên siyasî û çandî û civakî ji gelê kurd yê sûryê re.

şarezaniyeke kurdî dibêje : hindik hindik.. rindik rindik, û tevî nîr û rewşên siyasî û tevayî ji sûryê û kurdistanê sûryê re, îro guneh û çewtbûnek mezine dema hindêk siyasî yan rewşênbirên kurd, kurdên sûryê tev li hemû pîrsgirên her çar parçên kurdistanê bikin, di demekê de ku ta anha

zimanê kurdî li sûryê qedexeye, û projeyên şoven, mîna zinara erbî û serjimara awarte, û erebkirina navên cih û deverên kurdên sûryê, tevî wiha jî kurdên sûryê tu caran alîkarî ji ji tu parçeyên kurdistanê nexwestine, û nekîrîna seravde ji wan re, ji ber ku tu parçeyê kurdî ku hemû rê liwan girtîne, nikare li ber 2 yan 3 dewletan rabe, lewra divê hişyarên kurd haydarbin ji evê çendê re, û ji kurdên sûryê re bidne xuyan, ku erkê wan yê sereke parçeyê kurdistanê sûryê ye, tevî pêwistiya hevkarîyê bi kurdên cihanê re bi tevayî, ku doza mafên xwe dikin, li gora karbûna xwe.

kurdên sûryê ta roja îro nav û wêneyên damezraner û leheng û pakrewan û rewşênbirên xwe bilind nekîrîne, li navend û nivîsgeh û deverên xwe, ev jî pîrsgirêkeke derûtî (piskolocî) û jixwe nebawerkinke beloq û çavşikandineke mezin dide xuyakirin. gelo xaka kurdistanê sûryê, xakeke bê gele, yan " demuqrasiya birayê mezin" li ser evî parçî tê cî bi cî kirin ?

Derbasbûna tirkîyê û Êrîşên wê dijî herêma Efrînê, dide xwiyanî hovîtî û kîna wan li dijî gelê kurd.

Daxwaza wan tunekirina nasnameya kurdî û hebûna kurde li wê herêma resen ji Rojavayê Kurdistanê, di bin dengiya nav dewletî û bê dengiya netewên yekbûyî û cihanê de.

Li ber çavên hemiyan bi sedan sivîl dibin qurbanî bi destên artêşa Erdoxan û top, firokên wê yên cengî û çekdarên xwefiroşên bi navê Şoreşa sûrî.

û Êrîşên go berdewamin li ser gund, gundewar û bajarokên herêma Efrînê bombebaran dibin û vala dibin ji xelkên wê, bê ku hêzên navfêwletî van kiryar û qesabxaneyan şermezar bikin.

Êrîşa tirkan û destekên wan bi navê Operasyona Şaxê Zeytûnê bi bahaneya PYD, PKK cihê şermezariya gelê kurd û aliyên wî yên siyasî li her çar perçeyên Kurdistanê bû, û bi sed hezaran kurd rijîyan kolanan li Kurdistan û Ewropa, Encumena Niştîmanî kurdî li Sûriyê ENKS jî helwesta xwe bi ronî eşkere kir li dijî vê dujminkariyê û xwest ji PYD ku girtiyên di zindanan xwe de azad bike û dev ji gef û kîlê berde û vegere peymanê Duhokê bo yekrêziya mala kurd di vê qonaxa hestyar de.

Tirkîyê gefan dike li Minbicê û li hemî Rojavayê Kurdistanê piştî peymanê wê bi Rûsya re ku Putin sozên xwe bi cih ne anînin û PYD bi tenê hişt.

Hevpeymanîya Navfêwletî li dijî DAİŞ ê ku USA rêberiyê dike û hevalbendê wê ye sereke li Sûriyê QSD e ye nikarî bû tişteki bike û vê Êrîşa tirkan rawestîne, û herdû dewlet bûn cihê şermezariya kurdan ku bi hezaran şehîd danîne, û anî bîra wan careke din ku heval ji kurdan re tine ne ji bilî wan û çiyayên wan.

Gelê kurd ê xemgîn û hemî welatparêz li hêviya yekrêziya mala kurdin li Rojavayê Kurdistanê ku Karibin xaka xwe bi parêzin û mafên xwe misoger bikin di nav gur û çeqelan de ku hawîrdora wan kom dibin.



**Civata Emîndariya Encumenê**

Civata emîndariya giştî ya Encumena Niştîmanî Kurdî li sûrya di 11/12/2018 li bajarê Qamişlo de li darket.

Lîserkar û barên giştî û her wisa yek nêrîn û yek helwêstiya encumene di warê siyasîdî de . Girtîntîrîn xal :

1- di derbarê Êrîşên turkiya li ser devera Efrînê, tekez hat kirin li serhelwestên Encumenê di daxwiyayên derketî ku bi şewêwazek çav nêrînen zelal û piştevaniya mîletê kurd û kêşeya kurdî, û daxwaz hat kirin hemî rêxistinên alîkariyê ; û ji wan rêxistina komela xêr xwaziya Berzanî û bi cî awayî Encumen karibe alîkariya Efrînê bê kirin

2- li ser arîşeyên di navbera Encumenê û hemahingiya sûrî de derketin ; Ji ber cawaziya nêrînan di derbarê Efrînê de ,go bû cihê nekokiye û nûnerên kurd ji çivatê derketin nêrînen hemî pêk hatên Encumenê hatin xwiyakirin ji Emîndariya giştî , desteya serokatîyê, offisa peywendiyên liderve ji bo dîtina dinav bera Encumen û hemahingiyê de, û pêtiyê rêzgirtin li taybet mendiya deverên kurdan û taybet mendiya kêşa kurdî û bi cî awayê pêtiyê me bi hemahingiyê hebe ya wan jî bi me heye, û em rê nadin ji nêrînen tûndiraw di nav opozîsiyê. biryar û kiryarên şofênî û nejadperistî li ser gelê kurd û kêşeya kurdî. bèn danîn .

3- pêtiyê ko kombîn çêbinli gel Encumenên xocêhî û welat parêzên kurd li her bajarekî jibo şirovekirina nêrînen Encumenên û yekhelwestî li beramer rageyandinên dijî rastiyê û nehêlana rola wan li ser civata kurdî wek berdewamî ji xebata tevgera kurdî ya bê rawestandî ji bo mafên rewa yê gelê kurd û kêşeya kurdî

4- dûv çûn û şopandîna karê offîsên Encumenê , encumenên xwecihî û ya ragihandinê, yasayê ... ji bo bihezkirina kar û xebatê di vê qonaxêde



# GOTAR

Hojmara  
(0)



**Serhildana birçiyên li welatê  
terorê xwedî dike !!**



**Pîlanên dirokt bi şaxên  
dirêj li dijî kurda**

**Mihemed Balih Cuma**

Di roja 28ê Befranbarê de , xelkên bajarê Meşhedê rabûn ser peyan û daketin kolanan banga nan û azadiyê kirin , ji êş û rebenî û çewsandina rejîma Melayên Şî'e . Roja dî li Zankoya Tehrana paytext û Kirmaşana Rojhelata kurdistanê û çend bajarên dî daketin kolanan û sloganên dijî rejîmê got , ku yekem care di 40 salê buhurî de têne hildan li dijî desthelatdarên Şoreşa Îslamîmîna ( mirin bo Ruhanî , mirin bo Xamine'î... ) , û weke lehiyê li pitir ji 100 bajar û bajarokên Îranê de li seranserê wî welatî belav bû û serî hildan gelên wê ji Kurd . Ereb , Azer , Bilûc û Farisan . Pesîcên ewlekariyê û polîs û pasdaran bi hezaran xwepêşander avêtin zindanan , û nêzîka 50 ciwanî cane xwe ji dest dan û çarenûsa 3500 girtî ne diyare ta aneha . Di 20 rojên derbasbûyî de 8 ciwan di bin eşkenceyê de cane xwe ji dest dane , grev û protesto û xwepêşandan bedewamin bi taybet li ber dergehên zindanan û li derveyî welat . Emrîka û Yekîtiya Ewropa û NY hoşdarî dane rejîmê û partiyên Rojhelata kurdistanê bi taybet PDKI û KOMELE beyannameyên yekrêziyê derxistin û banga piştgiyaya serhildanê kirin . Cihê sirincê ye gelê Îranê 40% di bin xêza xizaniyê de dijî û rewşa milyonan xerabe , di dema ku rejîma wê bi milyard dolaran sale xerc dike di xizmeta ecindiyên xwe de û dide rejîma Esed , Hizbullah , û Hûsiyên Yemenê û teroristîna din .

Divê li vêderê de ji hemû Miletê Kurd re bête bigotin, ku Dewleta Turkiyî Sawdar û Daşa Xişxaşa Ayîna Musulmantîya Ereb nebes tenê bi dijî Miletê Kurd ve dide bicengkirin; lêbelê ew di rastîya rastî de xweser bî dijî Dewleta Emerikî û Berjewendîya wêna ve di Kurdîstana Rojava de bi rast û durust ve dide bişerkirin. Wer Serdarîtiya Sulatan Erdoğanê Osmanîyê Nevîyê Cengîzخان di encamê dawî de bi mîna Cenga Cihana Yekem de di der sala 1918 de careke din ji nuh ve bi dawîkirina vê Dewleta Turkiyî Kemalî de der sala 1923 de dide binabûdkirin û ew vê carê jî bi cihkirina Bendên Peyma Sever der sala 1920 de di Serxwebûna Kurdistanê de dide bimizgînîkirin. Wer ez bes û bî tena ve di vê Serdema me de didim bidîtin, ku dermankirina derdê Koletî û Bendîtiya Hovberên Sawdar û Daşên Ayîna Xişxaşa Musulmantîya Ereb ji bal Turk, Ereb û Faris ve di nava Welatê me de û li ser me de di vê Xurtbûna Dostaniya me de ligel Milet û Dewleta Israîlê de bi rast û Durst ve di bî carekê jî ve tete biderkevîtin. Wer roj bi roj ve di kûrbûn û qolbûna Dostaniyê de di nava Miletê Kurd û Miletê Israîlê de Rizgarîkirina Miletê Kurd ji bin tapanê Hovberên Sawdar û Daşên Ayîna Xişxaşa Musulmantîya Ereb ve ji Dagîrkerên Turk, Ereb û Faris ve tete bimizgînîkirin û Serxwebûna Kurdistanê û Konfederalîtkirina wêna ligel Israîlê de tete bigirawîkirin.

## GUHERTINA CIVAKA KURDÎ BI BER ASOYEKE NE DIYAR

**Ferhad şêxo**  
Silêmanî



Dema mirov li rewşa civaka me ya kurdî ya anha dinere dibîne ku civaka me li gelek qonaxan paşketiye û gelek kelem û astengî di civaka me diyar dibe û sedemên paşketina civakê jî pir in. Yekem Sedema herî bengehî û giring ew e Malperên tora medya civakî ya ku xwe li ser civaka me rast kir di van çend salên derbas bûyî de û bi taybet ( fêsbûk- tiwiter- enistigram ...) ku bûn sedem li ser jiyana miletên rojhilata navîn û bi taybet li ser jan û jiyana civaka kurdî û rewşa malbatên ku jiyana dikirin berî vê teknolojiya pêşkeva . Herwiha tê zanîn ku malperên medya civakî kelemên pêşiya dûrbûna penaberên li welatê Ewropa û Başûrê kurdistanê û Tirkiya û malbatên xwe li Rojavayê kurdistanê kêr kirin û bi awakî berfireh nêzîk kir lewra hin kes kêfxweş in bi van malperan . Lê bê guman gelek nerênî û nebaşiyê wê jî hena ji bilî erênîya wê , yekem rewşa civaka ma vala bû û her kes bî malperên xwe mijûl bûye ta ku silav û hevdiîtin bi taybet di nav malbatan jî kêr bûye û bi vî rengî ev kes jî malbata xwe vedikêşa û dûrdikeve ji ber ku her kes çavê wî li ekrana telefona yan laptopa xwe û pêwendiyên bi mirovên nenas dikin. Duyem Gelek nexwaşiyên derûnî derdikeve û mirov dixwaze bi tena xwe jiyana bike lewra vê yekê mirov dûrî adat û wêjeya civaka xwe dikeve. Ji ber vê yekê hin rewşên bîrên kurd û kesên di saziyên civakî de kar dikin bi nerînek tund li vê tiknolojiya temaşe dikin ji ber ku azaran li ser civaka û çanda kurdî dike. Sêyem ji ber van malperan gelek kes hevjiyana xwe ji xwe berdand, mixabin gelê me bi awakî xerab vê tiknolojiya bi kar tîna , ji ber xerabûna malbatê dest pêka xerabûna civaka kurdî ya. Tê zanîn ku gelê kurd bi pêşketina tiknolojiya re ye ji ber ku gelê kurd her dem daxwaz dike ku het tim çav vekirî be û ne dûrbîn ji pêşketina cihanê. Duyem ji ber rewşa aborî ya zehmet ku mirov tede jiyana dike û bûhabûna pêdeviyên jiyane ew ji bû sedema paşketina civak jî ber ku mirov gelek demjimêran kardikin rojane ji bû jiyane xweş ji malbata xwe peyda bike . Sêyem Temaşekirina rêzefilman û bi taybet Filmên Erebî û Tirkî û Hindî ku mirov çend demjimêran li ber wan dimîne ku bû sedemek ji korbûna Civaka me û guhertineke xirab xiste raman û mêjiyê keç û kuran de. Mixabin civaka kurdî di rewşek xerab bi rêve diçe û ev jî daxwaza dijîminê gelê kurd e , ku kurd dûrî civaka xwe ya rewa bi kevin, û pêwîst e ji Serkirdiyên kurd û siyasetmedarên gelê Kurd û rewşên bîr û navendên kurdî û bi taybet navendên saziyên civakî û civaka sivilî ku li ser vê aloziyê rawestîna û semînarên lîdarxî û çareseriyê jêre peyda bikin ta ku welatekî zana û pêşketî ava bikin.



# wêje



## Kurte Jiyana helbestvan XELÎL SASONÎ

D. Şiyar slêman

"Xelîl Sasonî" (1944 – 2017) Parêzer û helbestvan û rewşenbîrê pilebilind "Xelîlê Mihemed Elî", bi navê "Xelîl Sasonî" navdar e, li bajarê Qamişlo sala 1944 çavên xwe li jiyane vekirin, Sasonî ji malbateke welatparêz a xwedî dîrokeke balkêş e, Ew ji malabata Eliyê Ünîs e, xwedanên serhikdana Sasonê, Yên ku navê "Qewmê Çiyê" li wan dihat kirin. Sasonî yek ji helbestvanên kurd ên serdema zêrîn e, serdema Cegerxwîn û Tîrêj û Bêbuhar û Mele Ehemedê palo, û ji bilî wan jî ji stêrkên geş di dîroka Kurdî de, ew nîfşê ku hebûn ji nebûnê afirand, jiyana jî mirinê, azadî jî nav pencên stemkariyê tevî hemî birînan rizgar kirin. Nemir Xelîl Sasonî xwendina xwe ya berî zanîngehê li bajarê Qamişlo bidawî kir. Paş re çû zankoyê û di sala 1970 de ji kolîja mafnasiyê ya zanîngeha Helebê bawernameya Mafnasiyê wergirt. Lê wî nikaribû tevî sendîkaya parêzeran bibe ji ber ew yek ji kesên bênasname bû, û derdê biyanîbûna di welatê xwe de wek hemî kurdên di bin wê stemkariyê de dikişand. Lê wan derdeseriyên nikaribûn morîlê wî peya bikin û geşbûna xebat û têkoşîn û welatparêziya wî kêr bikin, wî bi kelecaneke bilind, dijî stemkariya sedên salan, rêça xebata xwe berdewam dikir, dixwest çand û ziman û kesayetiya gelê xwe vejîtin bike, û wî jî dil û can û bêwestan li gel welatparêzn wek xwe xebat kir, û karibûn bandoreke balkêş li civaka Kurdî bikin, û nîfşekî pêşketî û zana di nav refên civaka kurdî de biafirînin. Xelîl Sasonî jî bilî tore û helbesta kurdî, bizaveke wî ya jî dil û can di ber parastina kevnetor û kelepûra kurdî de hebû. Ji ber dijwariya rewşa jiyane nikaribû berhemên xwe wek dilê wî dixwest çap bike. Diwaneke wî ya helbestan tenê hatiye çepkirin, lê mixabin ew jî di bin navê Hwlbestên Cegerxwîn yê neçapkirî de hatiye çapkirin, ji encama şaşiyekê, ku piştî Seydayê Cegerxwîn Koça xwe ya dawî kir, ew helbestên Xelîl Sasonî di nav kaxezên wî de hatibûn dîtin. Çi çalakiya welatparêzî lîdarkerîba û bi taybetî di warê çand û huner û ziman û toreya kurdî de, Sasonî di serê govendê de bû. Sasonî jî dibistana helbestê ya riyalîst bû, û pir bandora Cegerxwîn û helbestvanên klasîk ên kurd li helbesta wî hebû. Ew yek ji têkoşerên bêwestan bû di ber parastina reseniya helbesta kurdî û kêş û terazûya wê de. Di 10 salên dawî jî temenê Sasonî de, nexweşiya penceşêrê li pişa wî xist, û ew coreyek dijwar ji coreyên penceşêrê tê naskirin û nexweşên wê nikarin demeke dirêj piştî wê bijîtin. Lê wî karibû bi moralê xwe yê bilind û viyana xwe ya xurt, nehêle ew penceşêr wî jidesthilanîn bixîne, û karibû bi dilê xwe yê mezin û viyana xwe ya mîna çiyayê Sasonê bihêz û bilind penceşêrê rezîl bike, û piştî operasyona çareseriyê, doctor û pizîşkên pispor matmayî mabûn ji vîna wî ya bihêz, ku bû sedem ku temenekî dirêjtir ji temenê nexweşên vî nexweşiyê bijî, û li gor doktoran digot berxwedana Sasonî awarte bû di nav kesên bi wê nexweşiyê dikevin ji encama nearamiya rewşa jiyane piştî Şoreşa Sûriyê ya 2011, û ji bo berdewamkirina çareserîkirina nexweşiya xwe, Sasonî çû bajarê Batmanê û çend salên dawî jî jiyana xwe li wir bûrandin. Xelîl Sasonî di temenê 73 salî de li bajare Batmanê di 3/12/2017 z xatirê xwe yê dawî jî jiyane xwest. Û li gor temîniya wî li Batmanê bi xakê hat spartin. Sasonî gelek berhemên û vekolînen giranbuha li pey xwe hiştin wek:

- Sê diwanên helbestan.
- Vekolîneke rexneyî bi zimanê Erebbî bi navnîşana "Cegerxwîn .. Saxê Nemir".
- Berhemek derbarê danhev û vekolîna stiran û dûrikên kurdî ên folklorî.
- Hejmarek baş jî pend gotinên bav û bapîran tevî lêkolîna derbarê wan.

Sasonî hejmarek jî xelatan di ware xizmeta kêş û toreya kurdî de wergirtine wek : Ø Xelata komîta amadekar ya çaktirîn helbesta şîna Berzaniyê Nemir di helkefta bîranîna sedsaliya jidayikbûna de sala 2013. Ø Xelata Mihrecana Muzîka Kurdî sala 2005 li bajarê Silêmaniyê, wek kesekî xwedî ked di ber folklorê kurdî de. Ø Xelata Cegerxwîn a sala 2009. Ø Xelata Mihrecana Helbesta Kurdî 2011. Sasonî bi laşê xwe jî nav me bar kir, lê bi giyanê xwe yê pak û berhemên xwe yê pîroz û giranbuha wê sermedî di dil û dîroka gelê xwe de bimîne. Gora wî buhişt be, giyanê wî nemir û aram be.



# wêje

Hojmara  
(0)



## Çiroka Çar bira

Luqman Silêman



## Efrînamîn

yisra zibêr

Çar bira Herçar endezyarê çandiniyê ne. Ebdil îlah Amedî. Ebdil îlah Hewlêrî. Ebdil cebar Mihabadî. Ebdil qudos Qamişloklî. Piştî ku her çara xwendina xwe, bi dawî kirin, ji hev re gotin, ka em vê buharê ji xwêre derkevin seyranê buhar xweş xuyadikê...? Vegeran hatin, malên xwe dema ku buhar bi rûyekî geş, bi ser wan de hat, xwe karkirin berê xwe dan seyranê, bi rêde li zeviyek erd rast hatin, şîndike mirov guneh dîke lê meyzâne, serdiyê simbila wî bostekî dirêj bûye, dide noqa zilama.. Her çar li ber zad sekinîn, Ebdil îlahê Amedî diha xwe dayê, çend gava ber bi zad de, çû li ber sekinî beşişî û li wan qulibî, ji wan re got: ev genim Îtaliye, diyare wê verêja wî pir baş be, ez bawem wê xwedyê wî di genim de bimînê isal...? Ebdil qudosê Qamişloklî jêre got: raste, ez jî dibêjim, ev genim Îtaliye û pir baş xuyadikê...? Ebdil îlahê Hewlêrî di ber xwede kenî, lê nehişt ku Ebdil îlahê Amedî li wî bîne der, ku ew kenîye.. Ebdil îlahê Hewlêrî serê xwe rakir, ji wan re got: raste ez jî dibêjim wê berê vî genimî pir baş be, lê ev genim ne Îtaliye,, ev genim Meksîkiye...? Ebdil qudosê Qamişloklî jêre got: belê raste, ez jî dibêjim ev genim Meksîkiye, verêja wî pir baş xuyadikê û xwedyê wî di genim de bimîne...? Ebdil îlahê Amedî pir tengjî, rûyê wî tevî hev bû, jixwêre got: çawe dibêje ev genim ne Îtaliye, lê deynekir...? Ebdil cebarê Mihabadî, bi qasî mirov mizekî li çixara xwe bide, ma sekinî, li genim meyzand ji wan re got: ez bi were, wê verêja vî genimî pir baş be û wê xwedyê wî di genim de bimîne, lê ev genim ne Meksîkiye û ne Îtaliye, ev genim Emêrkiye, ji simbila wî xuya ye, ma hûn genim ji hev nasnakî...? Herdû Ebdil îlah di zîkê xwede pir adiz bûn, rûyê wan sor û şîn bû, zimanê xwe gezkirin, lê dey nekirin...? Ebdil qudosê Qamişloklî jixwêre li wan meyzand, weku di dilê xwede bikene, lê newêrî li xwe bîne der...? Hersê bira, her yek di dilê xwede, ji hev tengjî, lê kesî deynekir, bi qasî mirov bijmêrê ta bi dihan...? Ebdil îlahê Amedî ji Ebdil qudosê Qamişloklî re got: te ji min re got, wek teye genim Îtaliye û te ji Ebdil îlahê Hewlêrî re got wek teye, genim Meksîkiye, lê te ji Ebdil cebarê Mihabadî re ne got: wek tey û ne jî te got: ka ev genim çîye, ka tu jî ji mere bêje, ka ev genim çîye...? Ebdil qudosê Qamişloklî serê xwe berda ber xwe, deynekir, her sê ketin gewriya hev, her yek ma li ser ya xwe ew dibêje, Îtaliye, yê dî dibêje Meksîkiye, yê dî dibêje na Emêrkiye...dengê xwe li hev bilind kirin gotin motinê ne dirê de dane rûyê hev, çavên xwe li dora xwe li kevira mevira gerandin dap ê li hev bixin, lê erdekî ripî rût tiştek, lê xuyanake.. hino hino ji hev çûne paş çavên xwe li dora xwe gerandin, ew erdê beriya kêfîkî ji dermana re, zixorek lê xuyanedikir, weku kevîr ji ezmana barîn bin, dora wan tev bûne kevîr...? keysa xwe li şer xweşkirin, xwe tewandin kevira li ber hev pehin bûn, beriya ku kevira deynin hev, xwedyê zad ji nav zad derket, ji wan re got: çî bela weye, gellî camêra...? Dema ku dengê, zilam kirin, di cihê xwede mane sekinî, kevîrê xwe di ber xwêre berdand, jêre gotin: ev zadê teye...? Zilam got: belê zadê min e çîma...? Her çara bi hev re gotin, em li ser ginimê te li hev nakin...? dema ku gotin, em li ser ginimê te li hev nakin, zilam kenîya, ji wan re got: deka bêjî çîma hûn li hev nakin...? Ebdil îlah Amedî jêre got: xalo ginimê te ne Îtaliye...? Beriya xwedyê genim baxîve Ebdil qudosê Qamişloklî got: erê xalo ez jî dibêjim ginimê te Îtaliye...? Zilam got: na xwarzî ginimê min ne Îtaliye...? Keyfa Ebdil îlahê Hewlêrî û Ebdil cebarê Mihabadî hat, di ber xwe de beşişîn.. Ebdil îlahê Amedî xwe bi ser hevde qermîqand? Ebdil îlahê Hewlêrî jêre got: min ji wan re dî got: ev genim Mesîkiyê we biya min ne dikirin...? Cardî Ebdil qudosê Qamişloklî got: belê xalo ez dibêjim ginimê te Meksîkiye.. Zilam ji wîre jî got: na xwarzî, ginimê min ne Meksîkiye...? Herdû Ebdil îlah rûyê xwe tîrş kirin, lê keyfa Ebdil cebarê Mihabadî hat...? Ebdil cebar ji wan re got: min ji were ne got: ginimê xalê min Emêrkiye we kenê xwe bi min dikir...? ne xalo mane ginimê te Emêrkiye...? Zilam jêre got: ne bavê xalo ginimê, min ne Emêrkiye ..? Herçara li hev meyzand, jêre gotin: tu kenê xwe bi me dîke...? Zilam bi dengêkî bilind, kenî ji wan re got: na ez kenê xwe bi we nakim, lê diyare hûn kenê xwe bi xwe dikin, ev ne genime, bavê xalo, ev ceye, ma hûn ceh û genim ji hev nasnakî, endezyarno, mane we li zangoyê pênc şeş sala li ser çandiniyê xwendiyê...?

Dil dinale ji êşa te  
Buhaye pîr vîna te  
Ji cergê şewitî weriya  
Ahîna ....û nalîna zarên te  
Dengê te bi babîsokêre dibihîzîm  
Xemla rengîna  
li baxên te  
Dil dilorîne ....  
can bikîne  
Kevoka aştiyê tê sotin li ber tîna agirê laşên  
te  
Peymana û soz ne hatin dan  
Bo nebînin şewata canête  
Efrînamîn ....  
Xwînamîn ji şaxên zeytûnên te  
Hebûnamîn ji reh û êlênxakate  
Nalînamîn ji êş û derdên birînhên te  
Efrînamîn rengînamîn .  
Ne bi êrîşan û ne bikuştîna  
Nikarin tune bikin nasnamate  
Nikarin bugherin navê te  
Wê bê avdan xakate  
Wê bê avdan zeytûnên te  
Efrînamîn ...  
birînamîn...  
Bê dawîye dasîtana te





# Helbest

Hojmara  
(0)



## Çemê Decla

Narîn Omer

Çemê Decla newa vînî  
 Meqamên renege reng tînî  
 Silavên xweş ji kû hatin  
 bi çavên geş di meyzînî  
 Silavên Dêrika Hemko  
 kulîlkin jêre rengînî  
 Meya Indîwerê kef da  
 Peyalên zer dineqşînî  
 Demarên dil semadarin  
 tu temtêlî tu raxwînî  
 Buhar zû tê li can ê min  
 er ê çawa di nêrxînî  
 Pira bafid resen textî  
 bi bircan her tu dengînî  
 Kevanên kevneşop rewşin  
 dibî rêzdar û navînî  
 Ciwan û kal buharvanin  
 ji bo dîtna te xwezgînî  
 Ji Xeydayê vexwim avê  
 bi min xweş tê te avînî  
 Eger çavên te bê coş bin  
 tu yê Xeyda bi xeydînî  
 Bijî Decla çemê jînê  
 tu alavî tu nûjînî  
 Kenê pêlên te dijwar hat  
 kela giryê min dertînî  
 Tu jî wek min evîndarî  
 bi awazên xwe zengînî  
 Dibêjî min temen xortim  
 ez im Mem can tu yî Zînî  
 Bi van peyvan dibim Basûr  
 diçin tev jan û xemgînî



## Keça agir

Fewaz Ebdê

Were lê!  
 Were hey keça rokê  
 Keça agir!  
 Were dilê min bi agirê evîna xwe bisoje!  
 Evîna min bi berfa çiya û zozanê xwe bişo!

Were lê! Were  
 Bêyî te  
 Ez wînda me  
 Kavilim, warê kunda me  
 Bêyî te  
 Cîhan bê denge  
 Gul pûteke ji kevire  
 Derya bê renege  
 Were can!  
 Were qurban!  
 Bila evîna me van çiyayan himbêz bike  
 Kaniyan derbike û  
 Bi ser deşt û çem û newalan de bipijiqîne  
 Beriya Mêrdînê  
 Bêriya cirîda hespê te kiriye  
 Şikeftên Heskîfê  
 Bêriya kenê te

Ezê derkevim serê çiyê û  
 Sê dangan bangkim:  
 Were gula min!  
 Were girmijîna min!  
 Were buhara dilê min!  
 Heger tu nehat  
 Wî çaxî

Ezê çavên te ji te bidizim û  
 Bi wan ezê nerîna dawî  
 Li Qamişloka evîne binerim  
 û çavên xwe li  
 Wêneyê te  
 Sawêrên te û  
 Evîna me  
 Bînim hev  
 û nema vedikim..  
 Nema.  
 18.04.2015

Agirê evîne  
 Heger evîna te  
 ----- bibe bablîsok  
 Ezê dilê xwe bikim pelê çilo û  
 ----- bavêjim nav dilê wê  
 Heger evîna te  
 ----- bibe ewreke reş û tarî  
 Ezê canê xwe bikim kevokeke sipî û  
 ----- bi nav perên wî ve bifirînim  
 Heger evîna te ----- bibe deryake ji agir Ezê  
 gemiyekê ji mûman çêkim û ----- xwe berdim  
 nav pêlên wê